



DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL
ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ

ENSTİTUYA DİYARBEKİRÊ BO
LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ

DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL
AND SOCIAL RESEARCH

JINÛVE BÎR LI YEKZIMANIYÊ KIRIN Û DAHATÛYA PIRZIMANIYÊ

5

RÊZEBELAVOKÊN BERÎ HER TIŞTÊ ZIMANÊ DAYIKÊ



Kurt İsmail Paşa
2. Sokak
Güneş Plaza No:18
21100 Yenişehir
Diyarbakır
Türkiye
T: +90 412 228 14 42
F: +90 412 224 14 42
www.disa.org.tr
info@disa.org.tr



**DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL
ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ**

**ENSTİTÜYA DİYARBEKİRÊ BO
LÊKOLİNÊN SİYASÎ Û CIVAKÎ**

**DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL
AND SOCIAL RESEARCH**

**BERÎ HER TIŞTÎ ZIMANÊ DAYİKÊ
WEŞANÊN DÎSAyê**

ISBN: 978-605-5458-07-2

Belavoka Berî Her Tiştê Zimanê Dayikê çerçeyeke projeya salane ya Bilindkirina Hişmendiyê derheqê Zimanê Dayikê û Duzimani di Perwerdeyê de ye ku ji şeş hejmaran pêk tê. Di van belavokan de derheqê mijarên wek têkiliya perwerdehî û zimanê dayikê, cihê perwerdeya ser esasa zimanê dayikê di xelaskirina newekheviyan de, cihê zimanê dayikê di jiyana civakî, kulturî û siyasî de agahiyên kêrhatî pêşkêşî gel bike. Hûn dikarin belavoka dumehî li ser malpera www.disa.org.tr peyda bikin.

Nivîsarên di vê belavoka me ya pêncem de cih digirin ji çend nivîskarên cuda hatine girtin. Wergerên kurmancî û tirkî bi destê Osman Mehmed hatine kirin, di tirkîkirina wan de keda Beril Eyüboğlu, Şemsa Ozar û Vahap Coşkun gelek girîng e. Ji aliyê rupelsazî û bergsaziyê de jî em gelek spas dikin Emre Senan. Em gelek spas dikin Veysel Akdeniz bo fotograen wî.

Ji kerema xwe herin रुपela www.disa.org.tr/onceanadilis.pdf an jî me agahdar bikin ji bo ku belavoka me bi dest bixin.

Çap: Ege Basım Matbaa ve Reklam Sanatları

Copyright © Gulan 2012

Belavoka **Berî Her Tiştê Zimanê Dayikê** wek gavekê projeya Enstitüya Diyarbekirê bo Lêkolînê Siyasî û Civakî (DİSA) ya bi navê Bilindkirina Hişmendiyê derheqê Zimanê Dayikê û Duzimani di Perwerdeyê de ku piştgiyariya fona Matra'yê ya Balyozxaneyê Holandê wergirtiye di bin berpîrsiyariya Şerif Derince de hatiye amadekirin. Dibe ku fikr û dîtinên di belavokê de cih digirin yek bi yek bi yê DİSA û Balyozxaneyê Holandê jî hev negirin. Ti astengî û rêgirtin tune li ber zêdekirin û belavkirina belavokê de tenê heke çavkanî bête destnîşankirin bi awayeke ron û zelal.

Bi arîkariya



Kingdom of the Netherlands

**JINÛVE BÎR LI YEKZIMANIYÊ
KIRIN Û DAHATÛYA PIRZIMANIYÊ**



Jinûve Bîr Li Yekzimanîyê Kirin û Dahatûya Pirzimanîyê

Îro ziman û pirzimanî li hindek welatan mijareke gîring a nîqaşê ye; digel ku li dinyayê li ser vî warî lêkolînên cidî û piralî tên kirin jî, desthilatên netewperest wek pêwîstîyeke polîtîkayên xwe bi giştî sepandinên yekziman hildibijêrin. Piraniya bîr û ra û tevgerên berbelav ên çî derbarê zimanan de çî derbarê pirzimanîyê de, ji sepandin û daneyên lêkolînên pêewle yên li gelek herêmên cîhanê serbixwe, bêhtir ji aliyê hêzên desthilat ên zordest û polîtîkayên yekziman ve tên destnîşankirin. Ev rewş dihêle ku bi taybetî komên bi zimanên xwe yên kêmîne diaxivin tûşî cudagerî û newekheviyên cidî bibin, her wiha ber li komên navborî digre ku nikaribin li beramber rewşên bi vî rengî bi awayekî bihêz têbikoşin. Rewşa Kurdên Tirkîyeyê jî nimûneyek e ku li vî yekê tê. Lê belê lêkolînên ku di warên cûrbicûr ên wek zimannasî, zanistên perwerdehiyê, derûnnasî, siyasetnasî û civaknasîyê de tên kirin, nişan didin ku tu bingehê baweriyên berbelav û pêşderaziyan tune ye. Armanca vê namilkeyê ew e ku zanyariyên pala xwe didin encamên lêkolînên pêewle bi raya giştî re parve bike û piştgiriya li wan têkoşinan bike ku di serî de Kurd komên cuda yên li Tirkîyeyê ji bo zimanê xwe yê zikmakî dimeşînin.

Bi vî gavê pênc xebatên cuda cih girtin di vî belavokê de. Di nivîsa yekem de, Jim Cumminsê ji Zanîngeha Torontoyê, bend bi bend û bi awayekî hêsan bê fêmkirin nişan dide ku bikaranîna zimanê zikmakî yê zarokên duziman an pirziman di perwerdehiyê de çîma giring e. Nivîsara duwem a ku ji nivîseke têra xwe berfireh a Carol Benson hatî kurtkirin û pêşkêşkirin jî, di ber rêgezên nivîsa yekem re, dîsa bend bi bend eşkere dike ku ji bo perwerdehiya pirzimanî bi berhemdartirîn awayî bê sepandin divê çî pêşniyarên berbiçav li ber çav bînin girtin. Nivîsa sêyem jî îdîa dike ku berevajî bawerîya berbelav, li cîhanê ne yên yekziman, lê yên pirziman di piraniyê de ne. Mijara nivîsa çarem, dora fêrbûna zimanan e. Colin Baker îdîa dike ku li gorî rewşê du an jî zêdetir ziman di heman gavê de bi hev re an jî yek piştî yê din jî dikare bê fêrbûn, esas ya giring ew e ku zimanên navborî bi awayekî baş bînin fêrbûn. Nivîsa dawî jî bi pênc pirsan dide xuyakirin ku ziman çawa wînda dibin û qonaxên windabûna wan çawa dişixulin.

Hêviya me ew e ku ev xebat li Tirkîyeyê bibe alîkar ji terkandina polîtîkayên zimên ên zordest ku berdeyam in û bihêle pêwendiyên wekhevanetir ên zimanî û civakî bînin sazînin.

Şerîf Derince

Enstîtuya Diyarbekirê bo Lêkolînan Siyasî û Civakî



Zimanê Zikmakî yê Zarokên Duziman: Zimanê Zikmakî Cima Giring e bo Perwerdehiyê?

Lêkolînên ligel zarokên duziman hatî kirin bi giştî nîşan didin ku zimanê zikmakî di pêşveçûna kesayeti û perwerdehiya wan de rolekî pir giring dilîze. Jim Cumminsê ku gelek lêkolînên wî heyî li ser vê mijarê û pêwîstiya bikaranîna zimanê zarokên kêmîne di perwerdehiyê de teorîze kirî, van tesbîtan wiha rêz dike:

1-Duzimanî bandoreke erênî li pêşveçûna zimanî û perwerdehi ya zarokan dike. Zarok eger di demên pêşî yên salên xwe yên dibistanê de bi du an jî bêhtir zimanan berdeyam bin li pêşvebirina jêhatinîyên xwe, derbarê zimên û bikaranîna zimên a bi awayekî çalak de dibin xwedî zanariyeke kûr. Bi taybetî eger bi her du zimanan jî xwedî xwende-nivîsendetiye bin, wê derfetê bi dest dixin ku derbarê bikaranîna zimên de bêhtir pratîkê bikin û berawird bikin ka her du zimanên ku pê diaxivin zanariya derbarê dinyayê de çawa bi awayên cuda bi kar tinin. Encamên zêdetir ji 150 lêkolînan ku di van sî û pênc salên dawî de hatî kirin, ya ku wextekî Goetheyê feylesofê Elman gotî bi awayekî bihêz piştrast dike: Mirovê ku bi tenê bi zimanekî dizane, bi rastî bi wî zimanî nizane. Lêkolîn nîşan didin ku ji ber zarokên duziman zanariyê bi du zimanên cuda dikarin bişxulînin, qabiliyeta wan a bîrbirinê (fikirîne) jî nemtir e.

2-Asta pêşveçûna di zimanê zikmakî de ya zarokan nîşaneyêke bihêz a pêşveçûna zimanê wan ê duwem e. Zarokê xwedî besatiyeke zimên a qehîm di zimanê zikmakî de dest bi dibistanê kirî, zehmetiyê nakşîne di pêşvebirina xwende-nivîsendetiya di zimanê duwem de. Dayîk û bav û kesên din ên guhdarên zarokan in (bo nimûne dapîr û bapîr), gava ji zarokan re bi zimanê wan ê zikmakî bi awayê ku bikarin hişê xwe yê bêje û têgînan bi pêş bixin çarokan bibêjin û hin mijaran jî niqaş bikin, zarok bi awayekî ji berê amadetir tînin dibistanê bo fêrbûna zimanekî duwem. Zanarî û jêhatinîyên zarokan ji zimanê zikmakî yê ku li malên xwe fêr bûne tê guhastin bo zimanê li dibistanê. Gava em ji aliyê pêşveçûna jêhatinîyên zarokan ên têgîn û bîrbirinê ve lê dinêrin, ev ziman bi hev ve girêdayî ne. Guhastina navzimanî dibe bi awayekî dualî pêk hatibe. Gava li dibistanê piştgirî li zimanê zikmakî bê kirin (bo nimûne bi bernamêyêke perwerdehiya duziman), têgîn û jêhatinîyên zimên û xwende-nivîsendetiye yên zarokan ku bi zimanê piraneyê fêr bûne, dikare bînin guhastin li zimanên wan ê zikmakî. Bi kurtî, heta ku di qada perwerdehiyê de destûr bê dayîn zarok xwe bighijînin her du zimanan jî ev her du ziman wê hev xwedî bikin.

3-Piştgirîkirina zimanê zikmakî li dibistanê tenê ne ji pêşveçûna zimanê zikmakî re lê ji pêşveçûna jêhatinîyên zarokan re ên di zimanê piraneyê de li dibistanê jî dibe alîkar. Ev keşf gava li ber siya keşfê beriya wê bê nixandî qet ne cihê matmayînê ye: (a) Duzimanî destkeftiyên zimanî terxan dike bo zarokan. (b) Jêhatinîyên di her du zimanan de bi pîvaneke giring pêwendîdar in ligel hev an jî ji hev serbixwe ne. Gava zimanê wan ê zikmakî li dibistanan bi awayekî fe'al bê fêrkirin, zarokên duziman wê serkeftîr bibin û di şert û mercên guncav de xwende-nivîsendetiya wan a bi zimanê duwem wê bi pêş keve. Berevajî wê, eger axaftina bi zimanê xwe yê zikmakî li zarokan bê qedexekirin, û di encama vê yekê de zimanê xwe yê zikmakî jî bîr kirin, wê mehrûm bimînin ji palpiştên kesane û têgînanê ku bo fêrbûnê dibin bingeh.



4-Hîndekariya bi zimanê kêmnîyê li dibistanan zererê naghîne pêşveçûna akademîk a zarokan bi zimanê piraneyê yê li dibistanê. Hin perwerdekar û dê û bav ji ber ku difikirin wê bernamêyên duzimanî zererê bîghînin zimanê piraneyê yê li dibistanê bi guman nêzîkî bernamêyên perwerdehiya duziman an jî hîndekariya bi zimanê zikmakî dibin. Bo nimûne, di bernamêyê duziman de ku % 50ê dema hîndekariyê bi zimanê zikmakî yê zarok e, % 50ê wê jî bi zimanê piraneyê yê li dibistanê ye, ev yek gelo bivê nevê li ber zarokan dibe asteng ku zimanê piraneyê yê li dibistanê fêr bibin? Yek ji keşfên ku lêkolînên perwerdehiyê yên li gelek deverên cîhanê hatî meşandin bi bihêztirîn awayî derxistîye holê ew e ku bernamêyên duzimanî yên bi awayekî xwedî rêgez hatî sepandin, piştgiriya zanyariya xwende-nivîsendetiye û qadê di zimanê kêmnîyê de kirine û nişan dane ku ev yek tu bandoreke neyênî li ser pêşveçûna zarokan a di zimanê piraneyê de nake. Di nav Ewropayê de, li Belçîkayê bernamêya Foyer ku jêhatîbûna axaftin û xwende-nivîsendetiye ya zarokên dibistana seretayî di sê zimanan de (zimanê wan ê zikmakî, Felemenkî û Fîrensî) bi pêş dixê, fêdeyên perwerdehiya duzimanî û pîrzimanî bi eşkereyî li ber çavan radixê.

Bi saya keşfên lêkolînan ên li jorê hatî kurtkirin, em dikarin fêm bikin ku perwerdehiyê bi vî rengî çawa pêk tê. Zarok bi riya zimanekî kêmnîyê (bo nimûne; zimanê di mala xwe de pê diaxivin) gava fêrî mijarên bernamêya hîndekariyê dibin, tenê bi ma'neyê berteng fêrî vî zimanî nabin, di heman demê de fêrî wan têgîn û hunerweriyên hişî (mêjîyî) jî dibin ku ji bo bikarin zimanê piraneyê bi kar binin bi awayê wekhevane pêwîst in. Xwendekarên ku bi zimanê xwe yê zikmakî dizanin sa'etan bibêjin, li têgîna wextê jî serwext dibin. Ji bo ku bikarin bi zimanê duwem (bo nimûne; zimanê piraneyê) sa'etan bibêjin, hewce nake ji serî ve fêrî têgîna wextê bibin; tenê hewce ye fêrî navên nû yên objeyan (tiştan) an jî wan zanyariyên hêsan ên berî niha fêr bûne bibin ku ji bo jêhatîbûna hişî hewce ne. He wiha, di astên li pêş de, jêhatîbûna di xwendin û nivîsandinê de û jêhatîniyên zanistî yên wek jevbijartina (ji hev cudakirina) fikrê sereke yê teksteke nivîskî an jî çîrokekê ji kitekitan, jevbijartina fikran ji rûdanan û analîzkirina tevna rûdaneke di çîrokekê de an jî di vegotîneke dîrokî de, wê ji zimanekî bo zimanê din bèn guhastin.

5-Zimanê zikmakî yê zarokan nazik e û dibe ku di salên pêşî yên dibistanê de bi hêsanî ji holê rabe. Gellek mirov şaş dimînin ku zarokên duzimanî di salên pêşî yên dibistanê de jêhatîbûna xwe ya danûstandinê di zimanê piraneyê de (her çiqasî digel ku ev zarok xwedî jêhatîbûna zimanê zanistî bin jî û pîr dirêj berdeham bike jî gihîştina wan a bo wan kesên ku zimanê piraneyê zimanê wan ê zikmakî ye) çiqasî zû "bi dest dixî". Ji aliyê din ve, bi giştî perwerdekar ewqasî hay lê nîn in ku zarok hunerweriya bikaranîna zimanê xwe yê zikmakî di mala xwe de ji çiqasî zû "ji dest didin".

Bergeh û leza windabûna zimên li dibistanê û li taxê li gorî zêdebûna malbatên ku ji komeke zimên a diyar tî, diguhere. Ger zimanê zikmakî li derdorên derveyî dibistanê bi awayekî têrtîje bê axaftin, windabûna zimên bi zarokên biçûk re kêmtir pêk tê. Lê belê, ger komên zimên bi jimar ne zêde bin an jî li herêmên diyarkirî hatibin "gettokîrîn", zarok piştî dest bi dibistanê kirin bi 2-3 salan dibe ku hunerweriya danûstandinê bi zimanê xwe yê zikmakî jî dest bidin. Her çend hunerweriya têgihîştinê bi zimanê xwe yê zikmakî bikarin biparêzin jî, gava bi hevtemenên xwe û xwişk û birayên xwe re biaxivin an jî gava bersivê bidin dê û bavên xwe wê zimanê piraneyê bi kar binin. Gava zarok gihîştin dema xamatiyê, dubendiya zimên a di navbera wan û dê û bavên wan de vediguhere kendaleke hestiyar. Xwendekar bi piranî dibin xerîbê malbatê û xerîbê kultura di dibistanê de—ku encamên vê rewşê bi hêsanî dikare bê texmînkirin. Ji bo kêmkirina windabûna zimên, divê dê û bav politikayên zimên ên bihêz ên navmalbatî bipejirînin û wan derfetan terxan bikin ku erk (xwendin, nivîsandin) û rewşên (bo nimûne; avakirina komên lîstîkê bi zimanê zikmakî, serdana welatê ku zimanê zikmakî lê tê axaftin û hwd.) ku wê zarok zimanê xwe yê zikmakî bi kar binin, zêde bike.

Mamoste jî bi rîya peyamên bihêz û erênî eger ji zarokan re bibêjin zanîna zîmanekî ji yekî zêdetir çend hêja ye û duzîmanîbûn nîrxekî girîngî zîmanî û hişî ye, dikarin bibin alîkar ji zarokan re da ku zîmanê xwe yê zikmakî biparêzin û bi pêş bixin. Dikarin wan projeyên navpolî bidin destpêkirin ku bi zarokan re bireweriya zîmên bi pêş dxin û zîmanên di nava polê de tîn axaftin bèn parvekirin. Ger em nimûneyekê bidin, mamoste wê li pîrîzmanîbûna zarokên di polê de bikole; û wê jêhatîbûna wan a di zîmên de pîroz bike û wan han bide. Her roj zarokek wê bêjeye ku pir tê bikaranîn ji zîmanê li nav malê tê axaftin di polê de bibêje û hemû xwendekar, wê ligel mamosteyê xwe fêrî vê bêjeyê bibin û li serê nîqaşê bikin.

6-Redkirina zîmanê zarok redkirina zarok bi xwe ye. Bi awayekî rasterê an nerasterê ger bo zarokên di dibistanê de peyama “zîmanê xwe û kultura xwe li devê deriyê dibistanê bihêlin” bê ragîhandin, zarok di heman demê de wê naçar bimînin parçeyekî girîng ji nasnameya xwe jî li devê deriyê dibistanê bihêlin. Gava pê hesiyar bi vî rengî tîn redkirin, wê beşdarbûna wan a bi bawerî û kiryarî di hîndekariya navpolî de pir kêmtir be. Ne bes e ku mamoste cûrbicûriya zîmanî û kulturî ya zarokan bi awayekî pasîf qebûl bikin. Divê însiyatîfê tîxin destê xwe û wêne û fotografên bi jêrnivîs bi zîmanên cûrbicûr ên li dibistanê tîn axaftin, li gelek deverên dibistanê deynin, û zarokan han bidin ku hevpêç ligel zîmanê pîraneyê yê li dibistanê bi zîmanê xwe yê zikmakî jî binivîsin. (Bo nimûne; zarok dikarin çîrokên duzîmanî binivîsin û ev çîrok dikarin bèn çapkirin). Dikarin etmofereke hîndekariyê biafirînin ku tê de ezmûneyên zîmanî û kulturî yên zarokan bi tevahî û bi awayekî fe’al bèn pejirandin û pesendkirin û bi vê yekê mamoste têkevin nav hewldaneke ku nasnameyên zîmanî yên zarokan pesend bikin.

7-Bidîrûvkirina nasnameyeke dînamîk bo dahatûyê. Perwerdekar ger wan polîtîkayên zîmên ên bi awayekî bihêz hatî pesendkirin di nav hemû tîkiliyên nav dibistanê de yên ezmûneyên zîmanî û kulturî yên zarok û civatên li herêma ku lê ne, bi pêş bixin û bernamayan xwe yên hîndekariyê li gorî vê yekê amade bikin, evê bê wê ma’neyê ku helwestek tê girtin li hember tevgerên neyênî û cudageriya di nav civakê de li dijî cudahiyên heyî. Dibistan, berevajî feraseta perwerdehiyê ya ku tîkiliyên desthilata zordest bi zorê dayî qebûlkirin, wê neynikeke pesendkirî û erênî bide ber rûyê zarokên duzîman derbarê ku di nava civakê de kî ne û dikarin bibin kî. Ger em perwerdekar em van deqên li jêrê ku em bawer dikin wê ji bo hemû zarokan pesendkirî be bîsepînin, zarokên duzîman wê zehmetiyê nekşînin di xweguncandîna li civaka xwe jî, li civaka gerdûnî jî.

-Ew hişmendîya ku em bibêjin zîmanê ku zarok di nav malbata xwe de bi kar tînin û kultura ku dijin dibe bîngeh ji jiyana wan a hîndekariyê re di dahatûyê de û em jî li şûna ku binê vî bîngehî bikolin divê em perwerdehiyê li ser wî bîngehî ava bikin;

-Ew rastiya ku her zarokek xwedî wî mafî ye ku qabiliyetên wî bèn naskirin û li nav dibistanê bèn piştgîrîkirin.

Bi kurtî, gava me dev ji wê yekê berda ku zarokên ji aliyê kulturî û zîmanî ve xwedî cudahî ne, wek “meseleyeke divê bê çareserkerin” bibînin û li şûna wê em van zarokan wek serçaveyên zîmanî, kulturî û entelektuel ku ji malên xwe li dibistanên me û civaka me zêde dikin, bibînin, wê sermîyanê kulturî, zîmanî û entelektuel ê civakên me têra xwe zêde bibe.

Prof. Dr. Jim Cummins

Zanîngeha Torontoyê, Navenda Bernameya Hîndekariyê, Hîndekarî û Fêrbûnê



Pêşniyarên Berbiçav Ji Bo Perwerdehiya Pirziman Bi Berhemdartirîn Awayî Bikare Bê Sepandin

Carol Bensonê ku modelên perwerdehiyê yê nê pirziman li ser bingehê zimanê zikmakî bi pêşxistî bi xebata li gelek herêmên cihê, çî ligel wezaretên perwerdehiyê û çî jî ligel komên kêmineyan, û jî bo ev modêl bèn sepandin hem xebatên akademîk hem jî yê sepandinî meşandî, li ber siya ezmûneyên cuda jî bo perwerdehiya pirziman bi berhemdartirîn awayî bikare bê sepandin hindek pêşniyarên berbiçav dîke. Ev pêşniyar hemû modelên cûrbicûr ên hîndekariyê radîpêçin ku Carol Benson palpişt bi encamên wan lêkolîn û ezmûneyên zêdeyî çîl û pênc salan li welatên cihê û bi zimanên cihê ew bi pêş xistine.

Pêşniyar 1: Zimanê zikmakî, bi kêmanî di heşt salên pêşî yê nê perwerdehiyê de divê bibe zimanê bingehîn ê hîndekariyê. Hemû zarokên niştecih û kêminê di her heşt salên pêşî yê nê perwerdehiya xwe de, bi zimanê xwe yê zikmakî (ger duziman bin bi her duyan jî) bêpare li dibistanên dewletê hîndekariya xwe bibînin. Piştî pola 8. zimanê zikmakî yê zarokan nebe navgîna sereke ya perwerdehiyê jî, bi kêmanî divê di polan de wek zimanê devkî bê bikaranîn û her wiha wek dersa zimên dema perwerdehiyê pê de bê fêrkirin.

Pêşniyar 2: Ger jî zimanê zikmakî cuda be zimanê herêmî an jî zimanê neteweyî divê bi awayekî berfireh wek dersa zimên bê fêrkirin. Zarokên mensûbê komên niştecih an jî kêminê, jî bilî zimanê xwe yê zikmakî zimanê herêmî an jî zimanê neteweyî yê ku berbelav e divê wek zimanekî duwem an jî bi awayê dersa zimanê biyanî, bi pêşengiya mamosteyên duziman ên xwedî ezmûnê jî polê 1. an jî 2. pê de fêr bibin. Her wiha qonaxa perwerdehiyê tevî pê de divê wek dersa bernameya hîndekariyê berdewam bin li fêrbûna wî. Ev ziman an jî kelûpel û rêbazên ku di hîndekariya zimanan de tên bikaranîn jî bi awayê li vê bigunçe, yanî bi awayê ku wek zimanê duwem an jî zimanê biyanî bê fêrkirin divê bèn amadekirin.

Pêşniyar 3: Derbasbûna jî zimanê zikmakî bo zimanê herêmî yê berbelav an jî zimanê neteweyî divê bi awayên li jêrê be: Hin dersên bernameya hîndekariyê dikare bi zimanê herêmî an jî yê neteweyî bèn dayîn, lê belê ev ne di salên pêşî de, di merhaleyên pêşî ên perwerdehiyê de û bi tenê li jêr çavdêriya mamosteyên xwedî tecrûbe divê bê kirin. Ger hewce be dersên wek perwerdehiya laşî, muzîk û resmî ku ne xwedî tevgerên fizîkî û naveroka akademîk in, dibe ku di polên seretayitir de bi zimanên duwem an jî sêyem dest bi fêrkirina wan bê kirin, lê belê dersên wek matematîk û dîrokê ku bi awayê zimanî pêdivî bi baldariyê kûr û ezmûneyê hene, bi kêmanî heta polê 7emîn, ger mumkin be di polên pêştir de jî divê bi zimanê zikmakî yê zarok bèn dayîn.

Pêşniyar 4: Dersên hevpeç, divê bi awayê dersa zimên bèn fêrkirin. Zarokên mensûbê komên niştecih û kêminê, jî bilî zimanê wan ê zikmakî û zimanên herêmî û neteweyî, divê zimanên wek Îngîlîsî, Spanî, Frensî, Rûsî û Hindî jî ku xwedî bikaranîna navneteweyî ne, wek dersên bernameya hîndekariyê bikarin fêr bibin.

Pêşniyar 5: Divê naverokên kulturî û rêbazên ku li dorhêlê û kontekstê biguncin bên bikaranîn. Bikaranîna zimanê zikmakî yê zarokan wek zimanê perwerdehiyê bi tena serê xwe ne bes e. Naverok û rêbazên hindekariyê yên li kultura wan biguncin, bi kêmanî divê du şertan bînin cih. Serê pêşî, divê li dorhêlê û konteksta ku wê lê bên bikaranîn biguncin û bikarin bên sepanandin, bi gotineke din li gel rûmetgirtina ji keleşor, ezmûneyên zanyariyê, nirx, dirok û nasname, kultura devkî an jî nivîskî ya komên navborî re, divê ev yek jî aliyê komên ku wê ji van bernameyan sûdê wergirin bikare bê qebûlkirin. Ya duwem; naveroka bernameya hindekariyê û rêbazên hindekariyê yên wê bên meşandin, divê jî ezmûn û zanyariyên zarokan û civatê bidin rê, bikin armanc jî xwe re ku xwendekaran jî 'edetên wan ên fikirîna rojane ya pratîk wergirin û wan ber bi fikirîna razber pile bi pile bibin. Ger hewce bike em bi awayekî din bînin zimên, şewaza besatiya zimên a bo hevkarîgeriyên rojane pêk bîne tê bikaranîn ku di lîteraturê de pir zêde bal tê kişandin ser (BICS)¹ û şewaza besatiya zimanê inforamatîk-akademîk ku ji bo fêmkirin û vegotina mijarên akademîk em wê bi kar tînin (CALP)² her du jî divê li qelem bên xistin.

Pêşniyar 6: Pêdivî bi mamosteyên duziman an jî pîrziman ên xwedî ezmûn heye. Tu guman tê de nîin e ku giring e mamoste pir baş gihîştîbin, lê belê ya giringtir ew e ku mamoste qet nebe duziman bin. Mamosteyên yekziman, bi taybetî jî yên ku bi zimanê zikmakî yê zarokan nizanin, wê nikaribin zimanan bidin ber hev û wê nizanibin ku xwendekar dikarin çî, cihê cihê an jî bi awayekî danberhevî fêr bibin. Her wiha mamosteyên yekziman, nikarin rê li ber wê yekê vekin ku xwendekar bikarin avantajên xwe yên wek bîrbiriya meta-zimanî³ ku ji pîrzimaniyê pêk tê, bi kar bînin. Bi ser de jî, mamosteyekî yekziman, nabe bibe modêlekî rol ê guncav jî bo xwendekarên ku bi awayekî pîrziman tînin gihandin.

Pêşniyar 7: Dê û bav, gel û wezîfedarên perwerdehiyê yên xwecih û kêmine, divê heta pêwîst dike xwedî zanîn bin li ser tercîhên zanyarî û perwerdehiyê ku xwe dispêrin encamên lêkolînan. Ger dê û bav, xwedî mafê hîlbijartinê bin li ser bê ka wê zarokên wan perwerdehiyê bi çî cûreyî wergirin, divê xwedî zanyariyêke têrtîje bin ku xwe dispêre lêkolînên qehîm û pêewle derbarê rêbaz û qonaxên perwerdehiya pîrziman de û derbarê bijartekên cuda (ku pêşkêşkirina van bijartekan pir giring e) û encamên demdirêj ên hîlbijartinên wan de. Di heman demê de wezîfedarên perwerdehiyê jî divê xwedî van zanyariyan bin – lê mixabin îro piraniya biryarên derbarê perwerdehiyê de jî aliyê rayedarên ku li ser van mijaran têra xwe ne pispor in ve tînin dayîn. Ji ber vê yekê giring e ku parêzvanî û xwedîlêderketina modêlên qehîm bi zanyariya ku xwe dispêre lêkolînan bê kirin.

Pêşniyar 8: Ji bo gihîştina perwerdehiya hêjatir divê li dibistanê û di nav civakê de veguherînan bastûrî bînin pîkanî. Ev yek, di heman demê de divê wê yekê jî li xwe bigre ku nîzamên heyî çawa zererê digihîne mirovahiyê. Dibistan neynika civakan in. Newekheviyên bastûrî yên di nav civakê de hem siya xwe berdidin ser dibistanan, hem jî jî dibistanan belav dibin û dibin sedem ku ji nû ve bînin hilberandin. Gelên xwecih û gelek komên kêmineyan di bîrtîrîn hiyerarşiyên civakî de cih digrin. Divê guherînan bastûrî di her astê de bi gerê bînin xistin. Xwediyên desthilatan divê li ber çavê xwe bigrin ku nîzama heyî tesîrê tenê li komên xwecih û kêmine nake, di heman demê de bi awayekî neyênî tesîrê li cîhanê tevî li şewazên mezaxtinê yên aborî, perwerdehî û civakî dike. Di her ku diçe kêmbûn û windabûna cudahiyan zimanî de li gel para dibistanan, nîzamên vêga heyî zanyariya derbarê wê yekê de ku wê çawa ber li windabûna cûrbicûriya biyolojîk bê girtin de jî tune dike (ji nav dibê), û şert û mercên berdeambûna jiyana li gerestêrkê bi awayekî cidî tê xerabkirin.

Prof. Dr. Carol Benson

Zanîngeha Stockholmê, Navenda Fêrbûn û Fêrkirinê



Li cîhanê gelo yên pirziman an yên yekziman di piraniyê de ne?

Çi di asta kesane de be çi di asta civakî de be, peydabûna meraqekê li ser mijara ku li cîhanê yên pirziman yan na yên yekziman di piraniyê de ne, li gorî dîroka cîhanê gelekî nû ye, herî zêde xwedî raboriyêke du sed salane ye. Bi gotineke din, em behsa rewşeke wisa dikin ku ligel netewe-dewletbûn û modernbûnê hevdem bi pêş ketiye. Hem hewldanên afirandina civakên homojen bi yekzimanîkirinê ku di ber mantiqê damezrîna netewe-dewletan re derketiye pêş, hem jî kêmtirzimanbûna wan dewletên Rojavayî ku dergûşa modernbûnê ne li gorî herêmên din ên cîhanê ji aliyê zimanî ve – ku digel vê yekê tu carî nebûne yekziman-, hiştiye ew bawerî bi mirovan re çêbibe ku yên yekziman di piraniyê de ne. Li gorî vê, ew bîr û boçûn berbelav bûye ku axaftina ji zimanekî bêhtir rewşeke mecbûrî ye ku piştê pêk hatiye û şert û mercan ev pêk aniyê, û ya asayî jî yekzimanî ye. Ji ber ku hinek pêşveçûnên akademîk û teoriyên sereke yên di warê zimannasî û derûnnasî û zanistên perwerdehiyê de ku nabe mirov wan ji qonaxên netewe-dewletbûn û modernbûnê bêbeş bike, dîsa ji aliyê zimanî ve ji deverên ku kêmtir xwedî cûrbicûrî ne derketine, an jî ji ber ku ev teorî li ser bîr û rayên alternatîf kara ye, hiştiye em bifikirin ku yên pirziman kêmtir in û yên yekziman jî pirtir in.

Lê belê tu welatê cîhanê li ser erdên ku yek ziman tenê lê tê bikaranîn nehatiye damezrandin. Mirov dibêje qey ji aliyê zimanî ve bêkestirîn herêm Îzlanda û Antarktika ne, lê li van deran bi xwe jî dîrokê pê de ji yekî zêdetir ziman hebûne. Ji aliyê din ve Çîn, Hindistan, Endonezya, welatên Emrîka Latîn, Rûsya, Papûa Gîneya Nû û hema hema hemû welatên Efrîqayê mazûvaniyê ji zimanên nejiimar re dikin. Bi ser de jî ev ziman tenê bi wê yekê namînin ku di jiyana rojane de tîb bikaranîn, di tîkiliyên gelemperî û danûstandinên nav-komî de jî bi awayekî fe'âl tîb bikaranîn. Bo nimûne; Hindîstana ku xwedîtiyê li nêzîkî pênsed zimanî dike digel ku bi awayê fermî xwe wek welatekî pirziman dide pênasekirin, bikaranîna piraniya van zimanan di perwerdehiyê de bi qanûnan tê handan. Di jiyana rojane de jî pratîkeke têra xwe berbelav e ku gelek ji welatiyên Hindîstanê li nav malê zimanekî an jî du zimanan, li kolanê zimanekî sêyem, li sûkê zimanekî din û dawiyê li dibistanê bi kêmanî du zimanên ji van cuda dibihîzin û bi kar tînin. Bêguman ev rewş nayê wê ma'neyê ku di nava van hemû zimanan de danûstandîneke wekhevane heye, lê belê dide xuyakirin ku pirzimanî wek qaîdeyekê hatiye pejirandin. Li netewe-dewletên wek Turkiyeyê jî ger bê hesabandin ku piraniya mirovan yekziman e, gelek welatiyên Turkiyeyê dibê li nav malê zimanekî, gava li kolanê dimeşin ji bilî zimanê xwe bi kêmanî yek an jî du zimanên cuda bibhîzin, li dibistanan jî dibê fêrî zimanên cuda yên nû bibin. Ev jî di rastiyê de berevajî ya tê zenkirin dide xuyakirin ku pîvan pirzimanî ye, lê yekzimanî jî hişmendiyek e ku bi riya polîtîkayên dewletê û plansaziya zimên hatiye afirandin. Lêkolîneke Eğitim-Senê (Komeleya Perwerdehiyê ya li Turkiyeyê) ku sala 2010an li seranserê Turkiyeyê hatî kirin, mîna ku bibe delil ji vê yekê re bi awayekî eşkere nîşan dide ku erdnîgariya welêt bi rêjeyeke bilind pirziman e.¹

Lê belê ya ku yên yekziman bêhtir xwedî desthilat, îmtiyaz û statûyeke bilind û rûmetê ne, ji bo kes û civakên pîrziman hin kêşeyan dirust dike. Bi taybetî li dewletên Rojavayî yên bihêz ên wek Îngilistan, Frensa û Dewletên Yekgirtî yên Emrîkayê demeke dûvdîrêj li pîrzimaniyê ecêb, neasayî û jê wêdetir bi gumana ku serçaveya kêşeyan e hatiye nihêrîn. Nîqaşên ku li van deveran tîn meşandin, her çend nîşan bidin ku pîrzimanî rêgezeke rûniştî ye ku divê bi ya wê bê kirin, ya di rastiye de divê neyê pejirandin jî yekzimanî bi xwe ye, baweriya berbelav a raya giştî wek ku ewqasî ji van xebatên akademîk ne haydar e xuya dike. Ji lewma qanûn bêhtir li gor yekzimanan tîn amadekirin û daxwaz û pêdiviyên malbatên pîrziman tîn piştguhkirin an jî tenê bi hindek îmtiyazên taybet bi baştirîn ihtimalê “bi xweşbîniyê” tîn bersivandin.

Lê belê van demên dawî bi bandora polîtîkayên lîberal pejirandina pîrkulturiyê wek polîtîkaya fermî ya dewletê û ji nû ve hêjayîpêdana pîrzimaniyê li hin welatên wek Awustralya, Zelandaya Nû, Spanya, Kanada û Skandînavayê, giring e. Bi ser de jî, konferans û çalakîyên bi sernavê “Zimanên Cîhana Firehtir”² ku li welatên Ewropayê yên wek Îngilistan û Hollendeyê dest bi lidarxistina wan hatî kirin, mizgîniyek e ji afirandina hişmendiyên nû re li ser vê mijarê.

Ger ev tev li ber çav bê girtin, dikare bê gotin ku ji aliyê dîrokî ve li cîhanê yên pîrziman di hemû çaxan de bi jimar di piraniyê de bûne, lê belê bi riya polîtîkayên cûrbicûr ên dewletan serdestiya yekzimanan hatiye pêkanîn û dorhêlek hatiye çêkirin ku zanyariya akademîk jî li gorî vê hatiye sazîkirin. Helbet ya ku yên pîrziman bi jimar di piraniyê de ne nabe rewşeke jiheqder bi tena serê xwe ji bo ku ber li cudageriyên heyî bê girtin. Lê belê têkoşînên polîtîk û kulturî yên civatên mensûbê zimanên cuda, li ser van mijaran bêhtir kirina hilberînên akademîk û aktîvîst, berbelavbûna bilez û ji her wextî zêdetir a hilberînên hatî kirin bi navgînan wek înternetê û her ku diçe bêhtir saziyên civaka medenî yên hesas xebatan dimeşînin, hiştiye ku pîrzimanî eşkeretir xuya bike. Bêguman vê yekê jî ihtimala serkeftina wan têkoşînan zêde kiriye ku ji bo parastin û berdeambûna pîrzimaniyê tîn kirin.

Şerif Derince

Enstîtuya Diyarbekirê bo Lekoînen Siyasî û Ciwalkî

¹ Eđitim-Sen. Anadilinde Eđitim ile İlgili Tutum Anketi. Ankara: Eđitim-Sen Yayınlar, 2010.
² Li ser vê mijarê li vê serçaveyê binêrin: <http://www.bgst.org/treab/sdz0100302.asp>



Zarok du zimanan bi hev re, an zimanekî piştî yê din fêr bibe baştir e?

Pêxistina du zimanan di heman gavê de jî fêrbûna zimanekî piştî yê din jî, riyên serkeftî ne ku ber bi duzimaniyê ve diçin. Wek ku di gelek serçave û nimûneyan de tê dîtin, gelek mînakên zarok, xort û navsereyên ku zimanê duwem bi awayekî serkeftî fêr dibin hene. Rastiyêke ma'lûm e ku xort û navsere beşdarî kursên zimên, dersên zimên dibin, û dikevin nav komeke ku bi wî zimanî diaxivin, carna jî gava xwe bi xwe fêrî zimanekî duwem dibin, bi vî awayî zimanê duwem hem pir zû hem jî bi awayekî fewqîla'de dikarin fêr bibin. Gelek kesên navsere hene ku di temenekî pir meztir ên wek heftêsalî û heştêsalî de jî zimanên cûrbicûr fêr dibin. Bi gotineke din, axaftina du an jî jê zêdetir zimanî di kîjan temenî de be bila be rewşeke mumkin e ku bê serketin.

Lê belê bêguman tê zanîn ku di temenên zû de fêrbûna zimanekî bo demeke dirêj encamên serkeftî bi xwe re tîne. Ger şertên nav malê guncav bin, zarok roj berî rojekê bi du zimanan bîh gihandin, dibe avantajek ji wan re. Ji ber sedemên wek fêrbûna zimanekî ya zarokên biçûk bêyî zehmetiyê bikêşînin û qabiliyeta bilêvkirina rast, û tebî'etê nealoz î dema zarokatiya berêtir, gava şert û merc guncav bûn divê duzimaniya zû bê handan. Bi vî awayî duzimaniya zû bo demeke kurt fêdeyên bîrbirinî û civakî, bo demeke dirêj jî îmtiyazên aborî û kulturî dibexşîne. Ger şertên malbatê destûrê bidin duzimaniya zû di jiyana zarok de, baştirîn pêşniyar ew e ku di kurttirîn dema pêkan de bê destpêkirin.

Yên nûgihîştî û yên navsere beşdarî dersên avjeniyê dibin û fêrî avjeniyê dibin. Teknîkên cûrbicûr ên wek beqekî, jixweremere, serpiştîkî û çarpêkî bi gelek temrînan, bi temaşekirina li mînakên û bi dihişêxwewerbirina tevgerên fîzîkî yê van mînakên ên di nava avê de, fêr dibin. Zarokên biçûk, bi awayekî hêsantir û xwezayî fêrî avjeniyê dibin. Ev rewş di fêrbûna zimên de jî derbas dibe. Axafîn, guhdarîkirin, xwendin û nivîsandin ku em dikarin van wek çar çaplên zimên bi nav bikin, gava tîh fêrbûn, hem zarok hem jî navsere her yek dikarin bibin avjenên baş. Ger derfeta zarokê pir biçûk hebe têkeve hewzê duziman, mantiqîtirîn bijartek ew e ku berî kêliyê mirov fersendê bide destê wî zarokî ku di nav her du zimanan de avjeniyê bike.

Di hin rewşan de piştî mirov bi layiqî fêrî zimanekî bû, fêrî zimanê din bibe, îhtîmal e baştir be. Ev yek bêhtir ji bo wan rewşan derbas dibe ku zimanên kêminê, li jêr gefa zimanê piraneyê ne. Ger di nava civatê de û li welêt zimanê piraneyê serdest be dibe bê tercihkirin ku berê zimanê kêminyê bê bipêxistin. Gava zarok dest bi derketina kûçeyê, dest bi çûna dibistanê, sûkê û cihên li derve kir û êdî bi xelkê re dest bi danûstandinê kir, zimanê piraneyê

bi gîştî bi lezeke mezin bi pêş dikeve. Giringtirîn xetereya li ber dê û bavên ku zarokên xwe hê di wextekî zû de bi zimanê piraneyê dane naskirin ew e ku wê zarok êdî her biçe bêhtir zimanê piraneyê bi kar bîne. Heta bi zarokên pir biçûk jî wiha bîra zimanê piraneyê dibin ku bêhtir rûmet û rêz lê tê girtin û qada wî ya bikaranînê firehtir e. Ji lewma bipêşxistina ziman û kultura kêmnîneye xwedî rayên qehîm giring e. Zarokekî ku zimanê piraneyê derengtir fêr dibe, dikare di demeke kurt de û bi hêsanî fêrî vî zimanî bibe. Jêhatîniyên xwe yên zimên ên ku bi zimanê xwe yê yekem bidestxistî bi rehetî dikare biguhêze bo zimanên duwem, û ji wergirtina wî zimanê piraneyê jî dereng namîne ku êdî hay li birûmetbûna wî bûye. Ji lewma, bi gîştî nabe problem ku mirov zimanê piraneyê ne zû, lê derengtir fêr bibe. Bi ser de berevajî da ku zimanê kêmnîneyê bê parastin dikare bê hîlbijartin jî.

Prof. Dr. Colin Baker

Zanîngeha Bangor, Galler

** Ev nivîs, ji kitêba bi navê A Parents' and Teachers' Guide to Bilingualism (Rêbera Duzimaniyê bo Dê û Bavan û Mamosteyan) ya Colin Baker hatiye lêanîn û wergerandin. Ji lewma dibe ku werger ligel teksta orijînal rasterast li hev neyên.*



Di Pênc Pirsan de Zimanên Wenda Dibin

Pirs: Wendabûna zimanehî çi diyar dike?

Bersiv: Bi giştî, heke malbat êdî zimanê xwe fêrî zarokên xwe neke û di axaftinên xwe yên rojane de bikar neyîne, ev ziman di riya wendabûnê de ye

P: Ji 6900 zimanên di listeya Ethnologue* de, niha çend ziman ber bi wendabûnê de ne?

B: Texmînen li ser vê pirsê li gorî kesan diguherin û cur bi cur in, lê pisporên mijarê, zimanzan dibêjin ku piraniya van zimanan nikarin bigehin zarokan. Wekî din jî zimanzan hemû hemfikir in ku ji nivê hemû zimanan zêdetir di vê rewşê de ne. Lê dîsa jî zêde nivîsarên yekgirtî nînin li ser angaştên hin zimanzan û rojnamegeran ku dibêjin gelek ziman di merhaleyê xeternak de ne.

P: Zimaneh çima wenda dibe?

B: Mirov dikarê faktorên ku alikariya vê rewşê dikin wisa rêz bike:
kêmbûna axaftvanên wî zimanî
temenê wan

rêjeya axaftina zarokan bi wî zimanî
bikaranîna zimanên din di gelek cihan de
hestên neteweyî û helwesta axaftvanên wî zimanî li ser zimanê xwe
malbarkirina metropolan
rêzik û kirinên hikûmet û mizgeftan/dêran
zimanê perwerdehiyê
astengiyên aborî û kedxwarî

Ji aliyê din ve jî, dibe ku ev ziman rola bihevregirtinê nelîze di nav civakê de ku piranî dema ku alfebeyê standart, berhemên edebiyatê di wî zimanî de û bikarînerên çalak ên bi wî zimanî dixwînin û dinivîsin kêmbin an jî tune bin ev rewş derdikeve holê. Dibe ku jî prestîja wî zimanî û piştgiriya axaftvanên wî tune be.

P: Gotinekê SILê jî ev e ku “tu ziman piçûk nîn in.” Ev gotin di nav xebatên vejîna zimên de roleke çawa dilîze?**

B: Bi vê prensîbê SIL piştgiriya xwe ya ji bo axaftvanên zimanên ji aliyê kêmbin kesan ve tîn axaftin nîşan dide û dixwaze ji nav wan kesan kesên ji bo zimanê xwe bixebitin ragihîne.

Di salên bihurî de, SIL bi civakên wisa re xebat kiriye ku zimanê wan ji aliyê sed kesan ve dihate axaftin û yekê dikariya bêje ku zimanê wan miriye. Îro gelek ji wan zimanan hêj jî nemirîne û tîn xebardan. SIL nabêje ku zimanê civakeke biçûk hewl û xebatan heq nake.

P: SIL krîterên çawa diyar dike ku ji bo zimanekî pêwistî bo xebatên vejînê heye?

B: Krîter gelek û cur bi cur in. Lê krîterên sereke “elaqe, daxwaz, beşdarbûn û biryarên rêvebirên ji civaka wî zimanî ne. Mirov dikare gelek alternatîfan pêşniyar bike, lê SIL di xebatên parastin û pêşvebirina zimanan de piştgiri dide kesan û her wiha saziyên hikûmetan û mizgeftan/dêran jî.

** Ansklopediya referansan e ku li ser kataloghîrîna 6900 zimanên dinyayê dixebite*

*** SIL rêxistineke sîvîl û nauneteweyî ye ku di sala 1934'an de hatiye damezrandin û li ser lêkolîn, berhevkirin û alikariyê zimanên kêmtir tîn axaftin dixebite. Ji malpera www.sil.org hatiye wergeradin.*



